

**PROGRAMA HILBIJARTINÊ 2019**

# **GUHERANDIN OPOSISYONÊ DIXWAZE**

## **SEKNA ME JIBONA BEŞÊN SOSYAL PIŞTÎ HILBIJARTINÊ WENDA NEBE**

### **Destpêk**

Mesrefên zêde ji bo xanî, aloziyên trafîqê, lêçûnên zêde ji bo jîyana rojane - ev pirskirêkan bi sala li Salzburgê hene. Le belê mixabin, partiyên desthilatdar bi tenê berî hilbijartina ser ev pirskirêkan diaxivin. Piştî hilbihartina ev sozên kû didin, ji bîr dikin û wek hertim guherandin çênabe.

Ji ber pergala kevn, ewê piştî hilbijartina şaredariyê, ê ku ev 27 salên dawî hatinin hilbijartin dîsa cîhê xwe di şaredariyêda bistînin - û ewê dîsa tiştêkî bi ser nexin.

Ji bo kû ev bê guherandin, hewciye kû li Salzburgê, denge kî bi bawerî û sosyal bê hilbijartin. Bi KPÖ PLUS pirskirêkên girîng nema tê ji bîrkin. KPÖ PLUS garantîya, pirskirêkên xaniyan û pirskirêkên civakî, piştî hilbijartinê jî nê ji bîrkin û ev pirskirêkên bê careserkin.

Hilbijartina şaredariyê a dawîyê, hew 50 deng kêma bûn jibona kû em cîh di şaredariyêda bistînin. Ji ber we ev car her dengek pir girînge.

Li Salzburgê jî guherandin kani çêbibe. Le belê jibo vêya pewiste hun 10. Adarê, meha Newrozê, meha guhardinê û nûhda despêkirinê alîkarîyê bi mer bike.

### **Kay-Michael Dankl**

Namzetê şaredariyê û namzetê serokatîya şaredariyê  
KPÖ PLUS Salzburg

**AM 10. MÄRZ**



# **XALÊN GIRÎNG**

## **1. Kirê gerek nebe sedem kû mirov pê xizam bivi**

Tuderê Awusturya mirov ne pewîste, wek Salzburgê ewqas perê ji bo kire bide . Ji ber rabûna bihayîyê jiyankirin zor dibe. Li Salzburgê ji 1.500 mirovan zêde, ji ber kû kirê pir bihayê, cêm malbat û hevalên xwe dijîn. Ji 7.000 heya 8.000 mirov di xanîyên bi zêde cûk dijîn, bi ser wî hawî ev mirov li xanîyakî gora xwe digerin. Le belê 5.000 xanî li nav bajarê Salzburgê valane.

Sereb, hêz, av, çop yanî veguhestina giştî: Jîyana rojane li Salzburgê her sal bihatir dibe. Her Sal hikmet perê serebe bi milyona zêde distîne. Ev ne tenê neheqîye, ev perê kirê jî zêde dike.

Dem dema partîyek xwe bide kêleka nişteciyan û bes cîh bide sipekûlasyonên ser kirê. Pewiste kû xerakirina pera jibona navdarîye dawî bibe.

KPÖ PLUS ji bo:

- Navbera 10 salên peşda cêkirina 10.000 xanîyen şaredariyê ê nûh.
- Daxistina xercên serebê.
- Sekinandina projên jibona navdarîyê.
- Qeyd kirina xanîyên vala û kar anîna wan.
- Alîkarî bi mirovên xizam jibona qawsiyonê, wek Grazê. Alîkarî jibona tamîr kirina xanîyan.
- Danina malên hevkar.

## **2. Veguhestinên giştî ê ku erzan, ji devla trafîqê**

Aloziyên trafîqê, bihayîya bilêtê veguhestinên giştî û gemarkirina hewayê: Aloziyên trafîqê jibona me hemûyan nebaşe. Vekirina garaja Mönchsberg yanî vekirina tûnêla Kapuzinerberg: Bersivê sîyasetmedara aloziyên trafîqê zêde dikin. Ev jibona jîyan kirina nav bajêr û avhewayê nebaşe.

Em, mirovên ji Salzburgê pewîste kû em kolanan şûnde bistîne. KPÖ PLUS dixwaze kû bilêtên jibona veguhestinên giştî bê pere be. Wek li Luxemburgê û Estlandê. Gava yekê, em gerek bilêtên rojane bikin yek ewro, bilêtên mehê bikin deh ewro û bilêtên salê bikin sed ewro. Gerek çûn û hatina bi otobosê siviktir bibe. Ev ne zorê, ji ber kû Salzburg AG her sal 20 mîlyon ewro jibona nav û derdora bajêr xera dike.

KPÖ PLUS ji bo:

- daxistina bihayîya bilêtan! 1 ewro ji bo rojekê, 10 ewro ji bo mehekê, 100 ewro ji bo salekê! Bi armanca karanînan veguhestinên giştî bi bê pere.
- Dirêj kirina rêyên Lokalbahnê heya Mirabellê.
- Leza 30 km/h nav bajêr, jibona ewlekarîya mirovan.
- Baş kirina rêyên bisiklêtê û ji hev qetandina rêyên bisiklêtê û ê otomobîlê.
- Zêde kirina rêyên otobosê û zêde kirina otobosa.
- Na ji garaja Mönchbergre, çêkirina parkan dora bajêr.
- Pewistîya parkirina otobosên tûrîsta dervî bajêr.
- Herêma bê pere di nav bajêr, wek li Grazê.

### 3. Demkrasî - danina biryara bi civakere

Sîyasetmedarên bajêr xwestinên mirovê li Salzburgê nadin ber cave xwe. Gelek mirovên li Salzburgê dijîn, destûra wan tuneye, tevî hilbijartine bibin û dengê xwe bidin. Biryarên girîng bê fikrên wan tên danin. Mirovên li Salzburgê dijîn baştir zanin ewê pirskirêkên nav bajêr cawa çareser bikin. Le belê, sîyasetmedarên bajêr û rêveberîya bajêr zêde durî pirskirêkên hemwelatîyane.

Kiriyên herî zêde li Salzburgê û meyaşên siyasetmedara gora derdorêdin pir zêdeye. Tu derê awusturyadin siyasetmedar ewqas meyaş nagrin. Cudahîya navbera karkeran û sîyasetmedaran roj bi roj zêde dibe. Jibona pirskirêkên rojane têgihîştina siyasetmedaran tuneye.

KPÖ PLUS ji bo:

- Hilbijartina nûnerên bajêr ê bi dilxwazî
- Mafê hemwelatîya hebe, dema li referandûmê sêr pirskirêkên qanûnî çê bibe û dengdan ji 3% zêde be, ev bê erê kirin
- Hevkariya şaredariyên dervî bajêr
- Di hemû astanda hevrêzî
- Heqê karahnîna deng jibona hemû mirovên li Salzburgê dijîn
- Daxistina meyaşên sîyasetmedara
- pabendbûna me: Meaşên sîyasetmedarên KPÖ PLUS ewê ji meaşên karkerên kalîffiyê ne zêde be. Perê ji ber meaşên sîyasetmedarên partîya me bimîne, ewe jibona alîkarîya mirovên di tengahîyêdene bê kar anîn

## **MIJARÊN JIBO SALZBURGÊ**

### **4. Karêkî baş, jîyanek xweş**

- Kêm kirina kar heya 35 saeten, pê kêm kirina meaşan û hevrêzî di hemû beşanda
- Zêdekirina karkera û zêdekirina meşa ji bo lênerîna kal û zarokan
- Zêdekirina ewlehî bûna kar
- Xistina sermîyananan di nav beşên xanî û jîyan kirin, lenêrîna kal û zarokan û
- veguhestinên giştî
- Mezinkirina navendên şewirdariya ser qanûnên kar

### **5. Xurt kirina mafên jinê**

- Meaşên wekhev jibona karê wek hev - girtina valahîyên di vê beşda
- Zêdekirina cîhê lênerîna zarokan, nezî cîhe kar û mala jinê
- Dema emekdarîya jinê hat, pewîste kû lênerîna zarokan wek karekî ber qanûnan bê naskirin
- Dermanê jibo kû zarok çênebe û mirovan ji ber nexweşîyan diparêze, pewîste kû bibe bê pere
- Ji ber xwe kirina zarokan, pewîste kû bibe bê pere
- Pewîste kû mala jina yan duda jî li vir vebe û mafên jinê hebe derkeve xanî

### **6. Perwardak baş jibona Salzburgê**

- Pewîste kû, Salzburg bibe bajarekî jibona xwendevanan: xaniyên erzan, bilêtên erzan û şahîyên çandê
- Dema zarok dervî dibistanê alîkarîyê jibona derzên xwe ji mamostên „nachhilfe“ bistîne, gerek ev alîkarî bê pere be
- Zêde kirina karkerên dibistanê wek pisqolog
- Çêkirina dibistana bi gora xwestinên mamosta û xwendavana
- Di navendên jibona ciwana pewîste kû cîhe derza xwe lê bixebitin hebe
- Kirina alîkarîyê bi nêrevanên ciwana, wek Akzente, kirina alîkarîyê bi malbatan

## 7. Beşdarbûna nav pêvajoya çandê

- Tev hev kirina bilêtên jibona şahîyên ser çandê, siporê û veguhestinên giştî. Ev hemû pewîste bibe yek bilêt, wek li Linz û Grazê
- Zêdekirina û ewlehî kirina karên nac çandê
- Jibona projên çandî pewîste kû birokrasî pêşîya van projan negire û rêya van pirojan bi alîkarîyan veke
- Pewîste kû alîkarî bi projên ne li ser çandê be jî bê kirin
- Vekirina cîhên çand kanibe xwe pêş xwe, mînak sûdîyo, cîhe prowaya
- Parastina medyayên azad, wek radîyo, televîzyon û print

## 8. Hemberî faşîzmê - jibona Salzburgek vekirî

- Navê rêyan gerek bê guherandin û navê wan bike navê şervanên hemberî nazîya
- Şehîd ketine yanî navê mirovên di bin destên nazîyade hatina kuştin
- Guherandina navê rêya Thorak-Straße li Aigenê
- Rakirina abîdeyên hûnerên nazîya, pêşîda rakirina peykerê Thorak li Kurgarten
- Pewîste ku şaredariya Salzburge semîner û perwerde ser dema nazî bide û projên ser ve mijarê bi alîkarîya rêya wan veke
- Zêde kirina berxwedana Salzburgê
- Zelalkirina sekna mirovên Salzburgê hemberî rast tundrewî
- Jibona mirovên bûne qûrbana nîjadperestî û e kû di nav jînaya xweyî rojaneda di nav gotinen nîjadperestî dijîn, pêwîste kû cîhê rawejkarî çê bibe

## 9. Qada gelemperî - bajarek jibo hemû mirovan

- Pêwîste jibona hemû wargehên Salzburgê, navendên bi çûk çê bibe. Li ew navendan ewê cîh jibona şahîyan, jibona pirtûkxanê û jibona ciwanan çê bibe
- Qedex kirina alkolê ev pirskirêkan çareser nakin - qedex kirin pirskirêkan zêde dike. Pewîste
- Şaredarî karê xweyî civakî baş û rast bike. Ji ber kû pewîste em bigehjin mirovên heya vê demê ji her alîda hatine taloq kirin û pewîste em alîkarî û cîh bidin wan di nav vî bajarî
- Hemberî xizanîye şer kirin, li şûna qirîmînalîze kirin: Rakirina qedexîya dest vekirine.
- Cîhe rûniştandinê di nav bajêr, pêşîda jibona kal û pîr a û jibona hevdîtina.
- Zêdekirine cîhê siporê - cîhê vekirî û bê pere jibona fûtbolê û cîhe siporê dinav parkanda
- Barîyer pewîste di nav bajêt tunebe - ji ser rîyan heya nav avahîyan
- Qumar pewîste bê qedexe kirin - dikan pewîste be qumar bin